Ez zarok im
û ez li welatê xerîbiyê li ewlehiyê digerim
an li malbata xwe li Ewropayê digerim

ombudsman
veřejný ochránce práv

parastina mafê giştî

Li vir li Komara Çekê, em ê ji we re bibin alîkar ku hûn malbata xwe li Ewropayê bibînin û ger hûn bixwazin biçin wan bibînin.

Netirsin ku hûn bipirsin ka hûn dixwazin tiştek zanibin an hûn tiştek fam nakin.

Ev belavok ji bo çi ye?

Te belavok girt ji ber ku

- te welatê xwe terikand
- dibe ku tu hewceyê alîkarî û parastinê bê
- û tu ne bi dê û bavê xwe û ne jî bi xizmên xwe re ye.

Em ê rave bikin ka çima nûnerê te heye. Parastina navneteweyî (penaberî) çi ye? Ger tu bixwazê biçê serdana malbata xwe li Ewropayê, her çend ti nexwazê an jî tu nekarê çi bikê. Ger hûn serlêdana penaberiyê bikin paşê çi dibe? Kî dê li ser daxwaza te biryarê bide. Tu dikarê çiqas zû biçê gel malbata xwe? Heta wê demê tê çawa bijî? Çima em şopa tiliyên te digirin û çi tê serê wan. Em ê jî binivîsin ka em dikarin te li cihekî (nêzîkî) bihêlin.

Di dawiya belavokê de, tê têkiliyên rayedaran bibînê ku tu dikaribê alîkariyê bixwazê, û rêxistinên ku ji karûbarên biyaniyan fam dikin û dê şîreta belaş bidê te.

Çima nûner dan min? Çi dike?

Zarokên di bin 18 saliyê de bi tena serê xwe (bê alîkariya mezinan) bi rayedaran re mijûl nabin. Ji ber vê yekê rayedar dê mezinek destnîşan bikin ku dê ji we re bibe alîkar ku hûn her tiştî birêve bibin. Em jê re dibêjin nûner.

Ew ê te şîret bike . Ji wî/wê bipirsin. Ger ew nikaribe şîretan li te bike, ew ê yekî din bibîne.

Ew ê bi her tiştê ku ti hewce ne alîkariya te bike. Ew ê ji te re bibe alîkar ku ti malbata xwe li Ewropayê bibînê, bi wan re têkilî daynin û biçin wan bibînê.

Dema ku ti bi rayedaran re biaxivê **ew ê bi te re be**. Tu dikarê bi wî bawer bikê - ew ji bo te li wire.

Parastina navneteweyî (penaberî) çi ye?

Parastina navneteweyî (penaberî) tê wê wateyê ku **ti karibê li welatekî din ewle bimînê** heger tu ji ber şer, perîşan an zirarek giran ji welatê xwe direvê. Nûner dê ji te re şîret bike ka meriv çawa serlêdana wê bide.

Dibe ku kesek şîret li te kir ku ti li welatê ku malbata te lê heye serlêdana penaberiyê bikin, wekî din tê nikaribê malbata xwe bibînê. Ev ji bo zarokan derbas nabe. **Ger tu li Komara Çekê serlêdana**

penaberiyê bide jî, em ê bizanibin ka malbata te li Ewropayê heye an na û em ê hewl bidin ku ti di zûtirîn dem de biçê serdana wan.

Ger malbata min li Ewropayê hebe û ez dixwazim wan bibînim ?

Ger tu bixwazê biçe gel malbata xwe ya ku li cîhekî din ê Ewropayê dijî bibînin, **em ê alîkariya te bikin ku ti herê wan bibînin (em ê heqê rêwîtiyê bidin** û bi te re herine wir). Tu ferq nîne heger te serlêdana penaberiyê kiriye yan na.

Malbat dê, bav, bira, xwişk, met, mam, dapîr, bapîr e.

Ji bo ku em wan bibînin, **em hewce ne ku hûn bi qasî ku gengaz li ser wan ji me re bibêjin** : nav, temen, hejmarên têlefonê, - e-mail, navnîşanên ku ew lê dijîn, an fotografên wan, heger we hebe.

Dema ku em malbata te bibînin, emê ji wan bipirsin ka ti dikarê werê wan bibînê. Ger ew ji me re bêje ku ew nikare we biparêze, tê li gel me bimînê - emê li vir li Komara Çekê li te xwedî derkevin.

Kesek pêşniyar kir ku alîkariya min bike ku ez herim malbata xwe bibînim. dibê ez biçim ?

Ger kesek pêşkêşî te bike ku tu malbata xwe bibînin, lê ew pere dixwazin an ji bo wan bixebitin, **haj xwe hebin** .

Rêyek weha dikare **xeternak** be. Dibe ku tu nekarib, malbata xwe bibînê.

Tu dikarê ji nûner an jî rayedarên xwe re behsa van kesan bikê u ji wan re bibêje.

Ez li vir bi tenê me (malbata min li Ewropayê tune ye an naxwazim biçim gel wan)

Heger ti bixwazê, **ti dikarê li Komara Çekê bimîne** .

Dûre tê li vir herê dibistanê, fêrî zimanê Çekî bibe û tê li vir bijî.

Niha tê xwarinê jî bistînê û tê bi zarokên din re, ên li vir bi tenê dijîn re bijî.

Ew belaşe (ti ne hewce tiştekî bidê).

Ez naxwazim serlêdana parastinê (penaberiyê) li Komara Çekê bidim

Heger ti nexwazê parastinê (penaberiyê) li vir serlêdan bikê jî, **dîsa ti dikarê bi gelemperî li vir bimînê**.

Em ê ji bo te bi zarokên din re razanê saz bikin.

Heger ez serlêdana parastinê (penaberiyê) bikim, kî biryarê dide? Pêvajoya Dublin çî ye?

Serlêdana te dê ji hêla **yek ji welatên Ewropî yên sîstêma Dublin** ve were biryardan: Belçîka, Bulgaristan, Komara Çekê (em), Danîmarka, Estonya, Fînlandiya, Fransa, Kroatya, Îrlanda, Îtalya, Qibris, Lîtvanya, Letonya, Luksemburg, Macaristan, Malta, Almanya, Hollanda, Polonya, Portogal, Avustrya, Romanya, Yunanistan, Slovakiya, Slovînya, Espaniya, Swêd,Nerwîc, Îslandiya, Swîsra, Lechtenştein.

Di **prosedûra Dublînê** de, dê were destnîşankirin ka kîjan welat dê li ser serlêdana te ya parastinê biryarê bide.

Çawa tê destnîşankirin ku kîjan welat biryarê dide?

Heger ti her gel malbata xwe bibîn, û em wan bibînin , welatê ku destûr daye malbata te bi wan re bijî dê li ser daxwaza we biryarê bide . Em ê te bibin wir.

Komara Çekê dê biryarê li ser serlêdana te bide , heger malbata te li Ewropayê tune ye ku ti dixwazê biçê gel wan.

Ezê çawa li vir bijîm heta ku ew biryar bide?

Her dem tê xanî, xwarin û doktor belaş hebin û tê dikaribê **biçê dibistanê**.

Çaxa ez serlêdana parastinê (penaberiyê) bidim çi dibe? Hevpeyvîn

Ji bo em zanibin ka kîjan welat dê li ser serlêdana te ya parastinê biryarê bide, **rayedar bi te re wê biaxivin** . Ewê pêşî rave bikin ka dê çi bibe û ji te re bibêjin ka mafên te çi ne.

Di hevpeyvînê de **wergêrek** heye ê her tiştî wergerîne zimanekî ku ti jê baş fêm dikê. Divê ew tiştên ku têne gotin wergerîne, divê tiştek zêde neke û jê dernekeve. Heger te ji wî fêm nakir an jî teva xweya kir ku ew xelet werger dike, ji karmend an nûnerê xwe re bêje. Her weha ti dikarê wê xêz bikê an jî binêvisîne. Paşê emê wergêrekî din ji tere bibînin . Netirse ji bo tiştem ti ji me re bibêjê - tercûman jî destûr ra nîne ku ji kesî re tiştên ku di hevpeyvînê de bihîstiye bêje kesî.

Nûnerê te dê di dema hevpeyvînê de her dem bi we ra bê. Lê eger tu vî nûnerî nexwazî, ji karmend re bêje emê yekî din bidin te.

Ma ew ê li welatê min zanibin ka min di hevpeyvînê de çi gotî ye?

Na. Tiştê ku ti ji me re dibêjê, ew nagihê welatê we, ji ber ku zirarê nede te û malbata te.

Ewê çiqas dem dirêj bi kê, ku ez bigihînim malbata xwe?

Bi gelemperî **em di nav sê mehan de piştî şandina serlêdana parastinê biryarê li ser veguhestina welatek din didin** . Welatê ku tu biçê ewê malbata te li wir ,divê qebûl bikê. Dibe ku dirêjtir be, lê herî zêde pênc mehan.

Heger tu bi biryarê razî nebê, tu dikarê îtiraz bikê. Nûnerê te dê di îtirazê de alîkariya te bikê.

Dûv re emê te **bi lez û bez** piştî biryarê (piştî îtîrazê) bibin cem malbata te. Lê herî dereng şeş meh piştî biryarê. Heger ti biçê girtîgehê an jî birevê dibe ku demek dirêjtir bikişîne.

Çima hûn şopa tiliyên min digirin? Eurodac çi ye?

Em şopa tiliyan ji her kesê ku herî kêm 14 salî ye digirin. Em wan li databasa bi navê "Eurodac" bar dikin. Bi vî awayî, em dikarin bibêjin ku te berê ji bo parastinê li welatekî din serlêdan dayî lê na.

Di Eurodacê de kîjan dane hene û kî dikare xwe bigihîne wan?

Di Eurodac da şopa tiliyên te û agahiyên ku ti kureke an keçike.

Nav, fotogref, tarîxa jidayikbûnê an hemwelatîbûna e (neteweya) teda **nîne**.

Tenê welatên sîstêma Dublin, di nav de polîs û daîra Polîsê Ewropî, dema lêkolîna tawanên giran (terrorîzm jî tê de) xwe digihînê databasa Eurodac.

Şopa tiliyan piştî 10 salan , an jî zûtirîn dema ku ti bibê hemwelatiyê welatekî ji sîstêma Dublin têne jêbirin.

Hûn dikarin min ewle bikin - bigirin?

Em ji bo zarokên di bin 15 saliyê de ewle nakin - em te naxin xaniyekî ku tu nikaribê jê derbikevê.

Em dikarin te ewle bikin heger:

- tu 15 salî ye û tu Komara Çekê tehdîd dikê, wek tu endamekî komeke terorîst an
- em nikarin bawer bikin ku ti di bin 18 salî de ne û em ditirsin ku ti birevê an jî xwe veşêre.

Dema ku em te bi zarokên din re bihêlin, divê ti hin qaîdeyan bişopînê. Mîna, bêje tu diçî ku derê û kînga tu ê vegerê, û bi şev li malê bimîne. Ev ne ewle.

Ez dikarim ji kîjan rayedaran alîkariyê bixwazim?

Daîreya berpirsiyar ji ber rêvebiriya Dublin û rêvebirê sîstêma Eurodac

Wezareta karê hundir ya Komara Çekê
Daîreya Polîtîkayên Penaberî û Koçberiyê
Beşa Navenda Dublin
Pošt. schr. 21/OAM, 170 34 Praha 7
+420 974 833 167
dublin@mvcr.cz

Daîreya ji bo Parastina Navneteweyî ya zagonî ji bo Zarokan
Šilingrovo náměstí 3/4, 602 00 Brno
+420 542 215 522
podatelna@umpod.cz
www.umpod.cz
kids.umpod.cz

Daîreya Navçeya Şaredariyê Praga 5
Beşa Pirsgirêkên Sosyial û Pêşîlêgirtina Tawanan
Beşa parastina sosiyal û yasayî ya zarokan
Náměstí 14. října 1381/4, 150 22 Prag 5
+420 257 000 437

Xaça Sor ya Çekî
Rozdělovská 2467/63, 169 00 Prag 6
+420 251 104 111
info@cervenykriz.eu

UNHCR - Daîreya Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî
Rytířská 31, 110 00 Prague 1
+420 776 437 775
www.unhcr.cz

Organîzasiyona Navneteweyî ji bo Koçberiyê (IOM) - Prag
Čechova 23, 170 00 Prag 7
+420 233 370 160, +420 233 376 791 (792)
iompraguecom@iom.int
www.iom.cz

Dadgeha Ewropayê ji bo Mafên Mirovan / Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê
Cedex
67075 Strasbourg, France
+33 (0)388 412 018921/6

Kî dikare bêpere şîretan bide min û pirsgirêkên biyaniyan fêm bike?

Şêwirmendiya ji bo entegrasiyonê
Opletalova 921/6, 110 00 Praha 1,
+420 603 281 269
praha@p-p-i.cz
www.p-p-i.cz

Şêwirmendiya ji bo entegrasiyonê, Ústí nad Labem
Velká Hradební 33, 400 01 Ústí nad Labem
+420 475 216 536

Diakonia Dêra Evangelîst a Birayên Çek
Belgická 22, 120 00 Praha 2
+420 242 487 812
info@diakonie.cz
www.diakonie.cz

Orgenîzasiyona ji bo Alîkariya Penaberan, Praha
Poděbradská 173/5, 19000 Praha 9 – Vysočany
+420 730 158 779, +420 730 158 781
opu@opu.cz
www.opu.cz

Orgenîzasiyona ji bo Alîkariya Penaberan, Brno
Josefská 8, 602 00 Brno
+420 731 448 938, +420 731 928 388
opu.brno@opu.cz
www.opu.cz

Orgenîzasiyona ji bo Alîkariya Penaberan, Pilsen
Sady Pětatřicátníků 48/33, 301 00 Plzeň 3
+ 420 604 809 165
opu.plzen@opu.cz
www.opu.cz

Orgenîzasiyona ji bo Alîkariya Penaberan, Ostrava
Českobratrská 2227/7, 702 00 Ostrava – Moravská Ostrava
+420 604 221 035, +420 731 502 661
opu.ostrava@opu.cz
www.opu.cz
www.cicops.cz

Navenda Entegrasiyona Biyaniyan
Pernerova 10/32, 186 00 Praha 8
+420 704 600 700
info@cicops.cz

Xêrxwaziya diesêza Litoměřice – Navenda şêwirmendiyê ji bo penaber û koçberan
Kosmonautů 2022, 412 01 Litoměřice
+420 416 733 487, + 420 416 731 452
migrace@dchltm.cz
www.dchltm.cz

Xêrxwaziya diesêza Hradec Králové – Navenda şêwirmendiyê ji bo biyaniyan û penaberan
Velké náměstí 37, 500 01 Hradec Králové
+420 492 604 940
dchhk@hk.caritas.cz
www.hk.caritas.cz

Xêrxwaziya diesêza Pilsen – Navenda şêwirmendiyê ji bo biyaniyan û penaberan
Cukrovarská 16, 301 00 Plzeň
+420 731 433 096
poradna@dchp.charita.cz
www.dchp.cz

Xêrxwaziya diesêza České Budějovice – Navenda şêwirmendiyê ji bo penaber û koçberan
Kanovnická 18, 370 01 České Budějovice
+420 734 435 344, +420 732 250 873
cizinci@dchcb.charita.cz
cizincicb.charita.cz

Xêrxwaziya archdiesêza Pragê – navenda koçberiyê
Londýnská 13/44, 120 00 Vinohrady
+420 224 813 418
www.praha.charita.cz

Xêrxwaziya diesêza Brno – Navenda şêwirmendiyê ji bo biyaniyan
Bratislavská 775/58, 602 00 Brno
+420 538 700 943, +420 739 531 841
celsuz@brno.charita.cz

Komeleya ji bo Entegrasyon û Koçberiyê
Havlíčkovo nám. 2, 130 00 Praha 3 – Žižkov
+420 224 224 379, +420 773 713 046, +420 605 263 035
poradna@migrace.com
www.migrace.com

InBase
Krumlovská 527/4, 140 00 Praha 4
+420 739 037 353
info@inbaze.cz
www.inbaze.cz

La Strada Komara Çek
+420 222 721 810
lastrada@strada.cz
www.lastrada.cz
www.facebook.com/lastradacr